# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1321 | 2-Mijdar-2025 | www.ronahi.net/ku/



Navnîşan

www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55

nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218


# ‘Koçberî hişt ku astengdar werin jibîrkirin’

Viyan Egîd/Qamişlo

**Asiya El-xidir ya 48 salî diyar kir ku ew ji ber jiyanekî bêbext di nava xizantiyê de mezin bû, xizantî bû sedem ku li erdê bimîne û tedawiya xwe neke.**



Jinek astengdare ku bi navê Asya El-xidir a bi temenê 48 saliye ku ji bajarê Serêkaniyê ye, ev nêzî 6 sal in Asiya li kampa Waşokanî niştecih bûye. Ew bi sedema nexweşiya germahiya laşî ku di 10 saliya xwe de hîskirina lingan winda kir, Esiya ji Rojnameya me re da zanîn ku wê zaroktiya xwe jiyan nekir û zehmetiyên giran di jiyan xwe de dît û heya roja îro jî berdewame. Lê dîsa jî Asya astengdariyê ji xwe re nekir dawiya jiyanê. Jineke bi hêvî û xeyalên vegera warê xwe jiyan dike. Di çarçoveya jiyan û zehmetiyan de Esiya El-xidir ji Rojnameya me re axivî.

Asya El-xidir jineke ji bajarê Serêkaniyê ye ku di sala 2019’an de ji ber êrişên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê, neçar man ku koçberî bajarê di bin sîwana Rêveberiya Xweser û QSD`ê de xwe bi cih bikin, da ku bi ewle jiyan bikin. Ev 6 Sal e ku Asya li kampa Waşokanî dijî, di nava ewqas zehmetî û astengiyên jiyanê de li ber xwe dide. Her wiha Asya bi sedemên hin nexweşiyan di 10 saliya xwe de hîskirina lingê xwe wida kir û li erdê ma, ji ber rewşa malbatê a madî lawaz bû, ew nikarî bû tedawiyê xwe bibîne, ji ber vê yekê niha temenê wê 48 saliye ku rewşa wê roj bi roj girantir dibe, ji lingan gihîşte destan, êdî nema dest û lingên xwe hîs dike.

### Xizantiya bê baxt; bû sedem ku ji 10 saliya xwe ve nexweşiyê bibîne

Asya diyar kir ku can û bedenê wê hatine rawistandin û got: “Ez niha ji dest û lingên xwe hîs nakin, tenê parçeya ku di canê min de di xebite, mijiyê mine. Ji ber vê yekê ez di tirim rojek ji rojan mejiyê xwe jî wida bikin. Dema ku nexweşî bikeve cihekî ji bedena mirov û neyê derman kirin, helbet wê belav bibe.

Ez ji 10 saliya xwe ve vê êşê dikşînim. Ez ne di nava malbatekî dewlemend de mezin bûm, her tim me bi xizantiyê re şer dikir, dema ez neweş ketime jî, ji ber sedema tunebûn û xizantiyê, malbata min nikarî min tedawî bikirana. Va ye ji 38 sal in ez di vê rewşê de jiyan dikim. Lê ev yek min ji xwe re nekir asteng, li ber hemû







zehmetiyên jiyanê min hêz girt û diviyabû ez bi hêz bim. Ji lewra ez heya niha bi tena xwe li ber xwe didim. Ji ber ku niha ez şerê gelek nexweşiyan dikin, ji bilî rawistandina dest û lingên min, di heman demê de nexweşiya şekir û tanisiyonê bi min re heye ku li ser dermanan jiyan dikim, dema ku ez dermanan qut dikin şekirê min dighîje 300-400, car caran derfetên min yên kirîna derman tune ye, ez bi tenê xwe jiyan dikin û nikarim karekî bikim ku debara jiyana xwe bikin û dermanên xwe peyda bikim.”

### Astengdar hatine jibîr kirin

Asiya El-xidir hin astengiyên xwe yên di kampa Waşokanî de bi dilekî xemgîn anî ziman ku gelek rêxistinên alîkariyê ji bo rewşa min nabin alîkar û got: “Ez jinekî tenê me, ji bilî tinê bûnê, ez li erdê me pêwîst e girîngî bidin kesên astengdar û pêdiviyên wan pêk bînin. Heya roja îro kursiyeke min tune ku ez karîbin biçim û werim. Lê mixabin kesên astengdar hatine ji bîr kirin ango jiyanê ji bo wan zêde dibînin. Ez niha tenê hêvî dikim ku vegera me ya Serêkaniyê çêbibe, ji ber ku eger mirineke min jî hebe, bila li ser axa bajarê min be. Di herî dawî de ez daxwaza alîkariyê dikin ku hin rêxistin xwedî li astengdaran derkevin, ji ber ku çawa mafê her kesî bi jiyanekî saxlem û nekêm heye, em jî wiha ne, bila tu kes ji bîr nekê ku em jî mirov in û mafê me yê jiyankirinê heye.”

## Gotina Dawî



### Da Kurd bibin xwedî statu

Mihemed Seydi

Her çiqasî Kurd di nava çar sînorên dewletan de hatibin dabeşkirin, lê çarenivîsa wan ji hev nayê qutkirin. Li Rojava Şoreşê dest pê kir, ji hemû Kurdistanê ciwanan berê xwe dan vê erdîngariyê û li dijî êrişên qirkirinê xwe kirin bend û mertal. Beriya wê jî li Başûr û him jî li Bakurê Kurdistanê, ciwanên Rojava ji bo bi destxistina statuyekê, berê xwe dan çiyayên Kurdistanê. Beriya wê jî ji bo Başûrê Kurdistanê berê xwe dan nava refên Pêşmergeyan û keda wan di bidestxistina Statuya li Başûr de jî heye. Îro roj jî dema pêwîstiya Rojava bi destekê hebe, ne ji ber parçeyên din ên Kurdistanê xwe deyîndarê vî parçeyê bi çûk dibînin, lê belê erk dibînin û ev erk heta îro bi dilxweşî pêk anîne. Lewma, çi li kîjan derê be, çarenivîs bi hev re tê diyarkirin. Ev jî sedem bû ku rêjîmên desthilat ên li Kurdistanê, bi hev re plan li ser Kurdan dimeşandin.

Em bînin bîra xwe ku di sala 2013’an de dema pêvajoya aştiyê ya di navber Îmraîlê û dewleta Tirk de dest pê kir, dihat gotin ew ê pêvajo çi bi xwe re bîne? Lê dema em bala xwe bidin dîroka pêvajoyê, em ê dibînin ku bi guhertinên li Sûriyê re dest pê kir û bi taybet jî bi tevgera Kurdan a Şoreşa 19’ê Tîrmehê re. Yanî, hedefa sereke ya ku Rêber Abdullah Ocalan dixwest bighêjê, ew bû ku Rojava li ser lingên xwe bisekine û êrişîn dewleta Tirk kêm bike. Heman wextê de dewleta Tirk jî wekî niha difikirî ku Kurdan li Rojava ji xwe re bike hêzeke ku pê rêjîma li Şamê bixîne û paşê jî ji xwe re bike xulam. Lê Ya Rêber AbdullahOcalan bi serket û dewleta Tirk negihişt encamê. Lewma destwerdan kir û Efrîn, Serêkaniyê û Girê Sipî dagirkirin. Herwiha pêvajoya ku di sala 2025’an de jî hat ragihandin, pêvajoyeke danûstandinê ya nû ye ku aliyekî wê rêber Ocalan û aliyê din dewleta Tirk e û ew jî yekser bi guhertinên li Sûriyê û rewşa Kurdan ve girêdayî ye. Her çiqasî dewleta Tirk ji guhertinên li herêmê û parçebûna Tirkiyê ditirse û lewma ketiye nava van danûstandinan, Îmralî jî hewl dide Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji nava vî agirê li Sûriyê pêketiye dûr bigre û ji bo wê jî gavên gelekî pêşbîn û wêrek davêje.

Herî dawî, biryara vekişîna hêzên Gerîla ji nav sînorên erdnîgarî yên “Tirkiyeyê” bû. Bi vê jî ji Turkiyê re got; ti têkiliya te bi hêzên li derveyî van sînoran re tune ye, û mafê te tune ku ji Kurdan (Hêzên Demokratîk ên Sûriyeyê) daxwaza danîna çekên xwe bikî. Ev jî di daxuyaniya Cemîl Bayik, hevserokê KCK de ku ji ANF’ê re axivî, eşkere bû ku got: “Danîna çekan Hêzên Demokratîk ên Sûriyeyê nagire nav xwe, û ti têkiliya wan bi vê mijarê re tune ye. Ev gav li ser perspektîvên Rêber Apo hat avêtin.

Bi vê jî Ocalan dixebite ku hemî hincet û hewlên dewleta Tirk ji bo êrîşkirina li ser Kurdan li Sûriye û Iraqê û dagirkirina axê ji holê rake. Ger dewleta Tirk jî bixwaze êriş bike, dê her şerekî pêşerojê bi Tirkiyeyê re li hember qada navneteweyî rewatir bike. Ocalan eşkere dibêje: An bi kurdan re li hev bikin an jî hûnê di agirê xwe de bişewitin û wê Kurd bibin xwedî statu.

Wekî ku Ocalan ji hêzên Rojavayî re jî bibêje; hûnê heta kengî bixwazin Kurdan ji xwe re bi kar bînin? ger hûn dixwazin hevalbendiyeke rast jî bikin, vaye Bakur û Rojhilatê Sûriyê û hûn dikarin peywendiyên durist bi wan re deyînin û wan nekin mijara bazara bi Tirkiyê re.

Li dawiyê dixwazim bibêjim ku mijara sereke ya tevgera Kurdan di sêrî de Rojavayê Kurdistanê ye da bighêje saxlemiyê. Hemû hewlên tên dayîn jî armanc ew e ku Kurd di qada navdewletî de bibin xwedî nasname û cih.

Sudoku:Pirs 64

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 1 | 2 | | | 3 | | | 4 |
| | 5 | | 4 | 1 | | | 3 | |
| 3 | | | | 5 | 8 | | | 9 |
| | | 5 | | | | | 6 | |
| | | | 8 | 4 | 6 | | | |
| | 7 | | | | | 9 | | |
| 6 | | | 9 | 7 | | | | 5 |
| | 4 | | | 3 | 5 | | 7 | |
| 8 | | | 6 | | | 4 | 9 | |

Sudoku: Bersiv 63

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 4 | 3 | 7 | 6 | 9 | 2 | 8 | 1 |
| 7 | 1 | 6 | 2 | 5 | 8 | 3 | 9 | 4 |
| 9 | 8 | 2 | 4 | 3 | 1 | 7 | 6 | 5 |
| 3 | 5 | 8 | 1 | 4 | 2 | 6 | 7 | 9 |
| 1 | 9 | 7 | 6 | 8 | 5 | 4 | 2 | 3 |
| 6 | 2 | 4 | 3 | 9 | 7 | 5 | 1 | 8 |
| 4 | 3 | 1 | 8 | 7 | 6 | 9 | 5 | 2 |
| 8 | 6 | 5 | 9 | 2 | 4 | 1 | 3 | 7 |
| 2 | 7 | 9 | 5 | 1 | 3 | 8 | 4 | 6 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Kêrvoşik û dewlik:**
- Ew tişt ne li gorî wî ye.

**Koçer û pîvazterik:**
- Ew tişt ne li gorî wî ye.

**Li bayê hev nehatin:**
- Keys jê nehat; li rastî hev nehatin; bi kêrî hev nehatin.

*Parçeyên makîneyê li bayê hev nehatin.

**Mala bavê bûkê gavan e qelenê bûkê giran e:**
- Ne li gorî rewşa xwe tev digere.

**Mehîna pîr û hevsarê rengîn:**
- Dema du tişt ne li gorî hev bin hingê tê gotin.

**Ne bi ser hev ve ne:**
- Ji hev nagirin; ne rast in; nakokî di navbera wan de hene.

**Rûvî û sûk:**
- Ew tişt ne li gorî wî ye.

**Se û mî bi hev re baz nadin:**
-Ne li gorî hev in; ne layîqî hev in; ji bo hev nabin.

**Serqoto li ber baranê, pîxwaso li ber garanê:**
- Ne bi ser hev ve ne; ne li gorî hev in; li hev nayên.

**Şivanî li mitirban nayê:**
- Ev kar ne li gorî te ye.

**Yê xinisî çû bal yê binisî; destê wî girt, got; ka em bireqisî:**
- Tişta ku tu dixwazî nabe.

**(Dema tiştekî ku ji destê mirov neyê, yan li mirov neyê ji mirov tê xwestin hingê tê gotin)**

**Zîn li bizinê dike/zîn li kerê dike:**
- Karê ne di cih de dike; tiştên ku nebin dike; tiştên ku li hev neyên dike.

**Zînê li ser pişta çêlekê ye:**
- Lê nayê; li hev nayên; ne li gorî hev in.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Kampanyayên jinên ciwan xwedîderketina li nameya Rêber Apo ye’



Berdevka Yekîtiya Jinên Ciwan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Bêrîtan Efrîn da zanîn ku kampanya Jinên Ciwan di 7’ê Cotmehê de li Kobanê bi silogana “Bi hevaltiya komînal bi Rêbertî re bijî û kom bibe” hat ragihandin û got, “Ev kampanya xwedîderketina li nameya Rêber Apo ya ji bo ciwanan e.”**R-2**

## ‘Zimanê çapemeniya dewletê ne zimanê demokrasiyê ye’



Rojnamevan Zeynep Durgut destnîşan kir ku di sedsala 21’emîn de çapemenî weke hêza cîhanî ya yekem tê pênasekirin, ji ber wê di guhertin û veguhertina civak, gel û netewan de roleke esasî û dîrokî dilîze...**R-2**


# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1321 | 2-Mijdar-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S


## Muslim: Divê dewleta Tirk gotinên xwe ji teoriyê derbasî pratîkê bike



Endamê Komîteya Hevserokatiya PYD’ê Salih Muslim diyar kir ku banga Rêber Apo û gavên dîrokî yên ku Tevgera Azadiyê avêtine tekez dike ku gelê Kurd, Tevgera Azadiyê û Rêber Apo aştî û aramiyê dixwazin, lewra ji bo serxistina pêvajoyê gelek qonax hene ku divê dewleta Tirk li ser raweste û gotinên xwe ji tewriyê derbasî pratîkê bike.**R-5**


# BI GAVÊN DÎROKÎ RE DEWLET NEÇAR E HEBÛNA GELÊ KURD QEBÛL BIKE

Dayika Aştiyê Qudret Eryilmaz diyar kir ku Tevgera Azadiyê û Rêber Abdullah Ocalan bi erkên xwe yên serdemê radibin û gavên dîrokî diavêjin, herwiha heya dawiyê baweriya gelê Kurd bi wan heye. Qudret Eryilmaz da zanîn ku li hemberî gavên dîrokî yên Tevgera Azadiyê êdî dewleta Tirk neçar e gavan biavêje û hebûna gelê Kurd qebûl bike.**R-6**









## ’Arvîn lehenga têkoşer e di romanê de’



Rojnamevan û nivîskar Rohat Bulut diyar kir ku Romana Arvîn têkoşîna gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê û qirkirina ku dewleta Tirk a li dijî gelê Kurd dida meşandin, vedibêje û got, “Min pêwîstî pê dît ku jina bi navê Arvîn bikim leheng ji romanê re û binivîsînim.”**R-7**

## ‘Çeteyên biyanî Sûriyê ber bi wêraniyê ve dibin’



Rojnamevan Dilyar Cizîrî diyar kir ku bi hezaran çeteyên biyanî di ser Tirkiyê re hatine Sûriyê û niha bi fermana Tirkiyê tevdigerin, ev jî wê metirsiya şerekî navxweyî mezin bike û aloziya civakî kûrtir bike û got, “Dosya çeteyên biyanî bi destê dewleta Tirk tên livandin.”**R-4**



Vekişana Gerîla!

Ahmet Aktaş — R-4



Rewatî Bizaveke Demokratîk A Pêşerojê Tayîn Dike Ye

Idrîs Henan — R-5



Kirîza hunerê di kirîza mirovahiyê de veşartî ye

Remezan Olçen — R-7

# 'Kampanyayên jinên ciwan xwedîderketina li nameya Rêber Apo ye'

**Berdevka Yekîtiya Jinên Ciwan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Bêrîtan Efrîn da zanîn ku kampanya Jinên Ciwan di 7'ê Cotmehê de li Kobanê bi silogana "Bi hevaltiya komînal bi Rêbertî re bijî û kom bibe" hat ragihandin û got, "Ev kampanya xwedîderketina li nameya Rêber Apo ya ji bo ciwanan e."**

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Yekîtiya Jinên Ciwan ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan di seranserî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek xebat û çalakiyên bi hebet lidar xistine. Di heman demê de di aliyê rêxistinkirin û perwerdekirina ciwan û jinên ciwan de, her li qadan e. Di van demên dawiyê de ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo dest bi kampanya kirin. ji bo em bêhtir li ser vê xebatê têbighêjin Berdefka Yekîtiya Jinên Ciwan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Bêrîtan Efrîn ji Rojnameya me re axivî.



**'Wê kampanya 4 heyvan dewam bike'**

Bêrîtan derbarê naveroka kampanyayê de wiha anî ziman: "Ev kampanya di 7'ê heyva Cotmehê li Kobanê bi diruşmeya "Bi hevaltiya komînal bi Rêbertî re bijî û kom bibin" hat îlankirin. Peyva kom bibin wê peyveke sereke di hemû siloganên di çalakiyên me de bêne lidarxistin de be. Mînak; "Ji bo xweparastin kom bibin, ji bo rêxistibnbûyînê kom bibin, li dijî tundiyê kom bibin hwd". Wê ev kampanya bi vê yekê bê naskriin her wiha wê 4 heyavn dewam bike, wê heyanî heyva Sibata 2026 dewam bike. Bi taybet ev kampanya ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ye, hemû çalakî ji komxebat, semîner, konferans û hwd wê ji bo azadiya fîzîkî a Rêbertî bin".

**Bernameya kampanyayê derket**

Bêrîtan di berdewamiya axaftina xwe pilansaziya vê kampanyê bilêv kir û wiha got: "Ji bo vê kampanyayê pilannameyeke têr û tijî derket. Wê sê komxebat li ser asta herêma Cizîr, herêmên Rizgarkirî û herêma Firatê bên lidarxistin. Di heman demê de weke em dizanin di heyva pêşiya me de meha tundiya li dijî jinê ye, wê di vê derbarê de jî çalakî û xebat bên organîzekirin, lê belê ev çalakî wê di bin navê kampanyayê de bên amedekirin. Helbet wê ev komxebat ji aliyê me ve bên orgenîzekirin, lê hemû kes, rêxistin, sazî û tevgerên jin wê tê de beşdar bibin. Her wiha wê konferans jî bê çêkirin lê hê dîroka wê nehatiye zelalkirin. Bi taybet ji bo tundiya li dijî jin wê di 24'ê Mijdarê de bi êvarê wê meşa meşele ya jin bê lidarxistin. Wê di asta rêveberiyan de perwerdeyek 6 rojan li ser parêznameya Rêbertî bê dayîn. Wê komînên jinên ciwan di bajaran de bên rêxistinkirin, ji ber di bin navê "Kom bibin" de wê komînên xwe ava bikin, wêne wê li ser dîwarên di kolanan de bên xêzkirin, giropên perwerdeyê yên biçûk wê bên avakirin, di heman demê wê filêksa kampanyayê li hemû bajaran bi beşdarbûna jinên ciwan bi cil û bergên Kurdî bên daliqandin, broşor wê bên amedekirin û belavkirin.

Her wiha di nava vê kampanyê de hemû şaxên jinên ciwan yên di partî, sazî û desteya ciwanan de cihê xwe tê de digrin. Hemû beşên jinên ciwan wê bi insiyatîfên xwe li cihên ku rêxistina xwe avakirne de çalakiyan di bin navê vê hemleyê de orgenîze bikin. Mînak wê Desteya Ciwan û Wezîşê çalakiyên sporî lidar bixe, her wiha Ofîsên Jinên Ciwan yên di PYD'ê û MSD'ê de komxebatan amede bikin. Tevgera Xwendekaran jî wê cihê xwe tê de bigrin. Êdî wê di pêşerojê de her kes wiha xwe birêxistin bikin".

**'Ev kampanya xwedîderketina li nameya Rêbertî ye'**

Bêrîtan di dawiyê de da zanîn ku ev kampanya xwedîderketina li nameya Rêbertî ya ji bo ciwanan e, her wiha ji ber çi ev kampanya bi taybet li Kobanê hat destpêkirin û wiha pê de çû:





"Bi destpêkirina banga "Aştî û Civaka Demokratîk" re Rêbertî nameya dîrokî ji hemû ciwanên Kurdistanê re rê kir ji ber wê jî em jî ji bo ku xwedî li wê bangê derkevin, me ev kampanya da destpêkirin. Di heman demê me çima ev kampaniya bi taybet li Kabanê dest pê kir, ji ber taybetmendiyeke cuda ya Kobanê ji bo Rêbertî heye, yekemîn car dema derbasî Rojava dibe derbasî Kobanê dibe ji ber wê jî me xwest em vê kampanyayê ji cihê yekemîn yê ku Rêbertî tê de li Rojava ma ye dest pê bikin".

# Nameya ku Rêber Apo ji bo Jineolojî şandiye bo me çi rave dike...(4)

**Îsyan Karadeniz**

'' Tê gotin ku femînîst dibêjin çima mêrek pêşengiya tevgera jin a Kurd dike. Mafdar in, xweziya jinan karîbûya ev pêşengî bikiraya. Min jî ev gelekî dixwest. Mixabin li derveyî tevgera Kurd jî, bi giştî jî hîn ev pêşengtî derneketiye holê. Min her tim got, divê jina azad çawa be û ji bo wê proje, teorî çêkirin; min bîrdoziya azadiya jinê û Jîneolojî pêş xist, min ev gihand hêza rêxistinbûnê. Min ji bo veguherandina mêr û bi rêya jinê azadkirina civakê hewldan kir, xebat meşand. Ji bo ku bibim zarokekî hêjayî xwedawendan, min ev yek kiriye. Ez bendewarim ku hun bi vê rastiya min, min bi awayekî rast fêm bikin.''

Ji bermahiyên xwezaya civakê heya roja me ya iro her tim damarekî berxwedêr a jinan û şopekê zindî ku li pêy xwe hiştine hene. Lê belê li ser vê axê pêşengên gel her tim hatine qetil kirin û negihiştine rêxistinbuyinekî bi domdar. Bi derketina Rêber Apo ve di milê jinê de jî ev lêgerina azadiyê rêyekî derketinê peyda kiriye; pêşeng û fermandarên hêja afirandiye. Di serî de di şexsê Ş. Sara, Ş. Azime, Ş. Besê Anûş, Ş. Bêritan, Ş. Zilan û gelek jinên têkoşer ku di salên destpêka avabuna rêxistinbun û artêşbuna jinê de rolekî sereke lîstine û gelek jinên têkoşer a di nava Tevgerê Azadiyê Jinê de rol û misyonên wiha girtine ser milên xwe hene. Ji çiya heya deşt û bajaran jinên pêşeng ên mîna Ş. Arîn, Ş.Barîn û Ş. Avestayan derketiye holê. Ger mirov bixwazî van navan zêdetir bike listeyekî dirêj derdikevê pêşberî me. Têkoşîn û ezmûnên van a jiyanê pir fêrker e û gelek ji van bûne mijara stran û romanan. Her yek ji me parçeyekê vê têkoşînê ye. Em jî di navenda vê şerê dijwar de ne lê di warê naskirin û zanînê de em çiqas xwedî hewldan in ev mijara niqaşê ye.

Erk û misyonê ku dikeve ser milên jinan di vê pêvajoyê de hîn zêdetir e û Rêber Apo jî di nameya xwe de ji bo na vê berpirsiyartiyê dibejê; '' Ez dizanim ku wê jin pêşengiya pêvajoya "Aştî û demokrasiye" ya ku em hewl didin pêş bixin, bikin. Ew xwediyên ji nîviyê zêdetirî serkeftinên ku heta niha hatine bidestxistin in. Bawer dikim ku wê ji niha û pê de jî pêşengiyê bikin û dibêjim ku ji niha û pê de jî, ez ê her tim qasî ku hun pêdivî dibînin bi we re bijîm û bi we re bim.''

Heger Rêber Apo bi vê hêst û nêzikbunê ve me his dike û bi me re ye vê çaxê tiştê ku dikarî li pêşiya me bibe asteng heye gelo? Hêza jinan a birêxistinkirî, xwedî azwerî, bi çalak hebe ger, kijan hêz dikarî herîkîna wan bide sekinandin?

Li vir yê esas ketina ferqa hêza xwe ya rêxistinbuyînê ye. Wekê ku Rêber Apo jî tîne ser ziman heger armanca jinê mîna tavê zelal be wê dikarê rê û rêbazê xwe peyda bike.



# 'Arvîn lehenga têkoşer e di romanê de'

**Rojnamevan û nivîskar Rohat Bulut diyar kir ku Romana Arvîn têkoşîna gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê û qirkirina ku dewleta Tirk a li dijî gelê Kurd dida meşandin, vedibêje û got, "Min pêwîstî pê dît ku jina bi navê Arvîn bikim leheng ji romanê re û binivîsînim."**

**Hemza Sêvo**

Rohat Bulut yek ji nivîskarên ku di 9'emîn Pêşengeha Pirtûkan a Amedê de romana xwe îmze kir. Pirtûka Rohat Bulut a bi navê "Arvînê" ji Weşanên Aryenê derket. Derbarê heman mijarê, Rohat Bulut bersiva rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:




**-Pirtûka Arvînê ji bo me bide nasîn, te kengî dest bi nivîsandina vê berhemê kir?**

Pirtûka Arvîn dîrok-roman e. Min di pêvajoya 2015'an dest bi nivîsîna wê kir û heta 2018'an berdewam kir. Min bi vê pirtûkê xwest jiyan, têkoşîn û berxwedana dîrokî ya gelê Kurd a li dijî êrîş û polîtîkayên qirkirinê yên dewleta Tirk vebêjim û ragihînim. Li Bakurê Kurdistanê bi ragihandina xwerêveberiyên cewherî re ji aliyê dewleta Tirk ve êrîşên hovane pêk hatin. Li Cizîr, Nisêbîn, Sûr, Gever, Şirnex, Silopî, Farqîn û hwd. dewleta Tirk xwest gelê Kurd di qirkirinê re derbas bike. Komkujî pêk anî û bê guman Rojavayê Kurdistanê jî hebû. Wekî rojnamegerekî min hemû geşedan ji nêz ve dişopand û min xwest qeyd bikim. Bi demê re fikriyeta ku ez wê bikim pirtûk pêş ket. Ew ji bi teşwîqa hevalan.

**-Mijarên ku te girtine dest çi ne, çima herî zêde te bal kişandiye ser mijara nasname û neteweya Kurdî û te xwestiye nameyeke çawa bi riya vê pirtûkê bide xwîneran?**

Min di vê pirtûka xwe de rewşa Kurdan nivîsiye. Kurdan çawa li ber xwe dane, çawa têkoşiyane, çawa rastî îxanetê hatine. Ji serdema kevnar, heta niha rewş û rastiya gelê Kurd min hewilda ku bi zimanekî xwîneran jî aciz nekim vebêjim. Bê guman lehengên ku di vê serdema dîrokê de ji bo azadiya Kurd û Kurdstanê têdikoşiyan jî hebûn. Lehengên pirtûka min jî hebûn ku Arvîn yek ji wan û ya sereke bû ku di kêliya xwerêveberiyên cewherî yên li Bakur ji bo gelê xwe dest bi têkoşîna azadiyê kir. Lewre gelê Kurd wekî her serdemên dîrokê di vê serdema xwerêveberiyên cewherî jî rastî tundiyeke mezin hat. Ji aliyê dewletê ve hat armanckirin ku "kevir li ser kevir, serî li ser laş nehêlin" û navê wê plan û armanca xwe jî danîn "Plana Çongdanînê." Li pêşberî vê plana qirêj jî, gelê Kurd li bajar û navçeyên xwe têkoşiyan. Hebûna xwe û axa xwe parastin. Bi taybetî jî ciwanên Kurd bi pêşengiya Tevgera Azadiya Kurdistanê li ber xwe dan û têkoşiyan. Belê bedelê vê berxwedanê giran bû, lê di heman demê de de jî pêşî li qirkirinek mezin hat girtin. Plan û polîtîkayên dewletê vala derxistin. Bi canbexşane têkoşiyan û çarenûsa gelê Kurd guherîn. Bi taybetî li Cizîr, Sûr û Nisêbînê. Belê wekî gotibûn li van cihên ku min behs kir, "Kevir li ser kevir nehiştin", bajar hilweşandin. Lê belê berxwedana ciwanên Kurd destûr neda ku "Laş bê serî" bimîn. Ji ber vê berxwedan û têkoşîna dîrokî ya ji bo gelê Kurd ku wekî rojnamegerekî min ji nêz ve ew kiliyên şer dişopand, xwe berpirsyar dît ku binivîsim.

**-ji bo çi te navê Arvîn hilbijart û çima te li ser jinê bi taybet nivîsandiye?**

Arvîn, yek ji jina Kurd e ku di wê serdema xwerêvberiyên cewherî yên li Bakurê Kurdistanê de ji bo azadiya gelê xwe ji bajarê Tirkiyeyê tê Kurdistanê. Jiyan û fêhmkirina Arvîn, watedayîn û li xwe vegerîn girîng e. Lehenga sereke ya pirtûkê ye ku di temenê xwe yê zarokatiyê de hewl dide wateyê bide hin tiştan. Hertim ketiye nav lêgerînekê. Dixwaze ji nêz ve welatê xwe nas bike, ji bo gel û welatê xwe têbikoşe. Êdî ji xwe re hin armanc û xeyalan çêdike. Ji bo bigihêje armanca xwe bi şev û rojan difikire. Di encamê de jina Kurd di nav têkoşîna azadiyê de cihê xwe digire. Arvîn, hem xwe azad dike hem jî ji bo azadiyê têdikoşe. Ev gelekî girîng e, bi hezaran lehengên jinên Kurd ên di nav têkoşîna azadiya Kurd û Kurdistanê de têdikoşin hene. Arvîn jî yek ji wan jinên Kurd e. Lewma jî wekî ku rojnamegerekî ji vê têkoşîn û biryardariya Arvîn re şahidî kiriye, jiyan û serpêhatiyên wê guhdar kiriye, pê re hevaltî kiriye û dem derbas kiriye min pêwîstî pê dît ku jineke wiha leheng binivîsim. Bijartina min a Arvînê, vîna wê ya têkoşerî û biryardariya wê bû.

**-Xebata ji bo zimanê Kurdî li Bakurê Kurdistanê çawa dinirxîne, erka ku dikeve ser milê gelê Kurd ji bo parastin û pêşxistina zimanê Kurdî çi ye?**

Li gorî salên borî xebateke ji bo çand û zimanê Kurdî ya berbiçav heye. Lê mirov nikare ku bêje ev xebat ji bo gelê Kurd ê Bakurê Kurdistanê dibe bersiv. Lewre gelekî qels û nebes e. Lewre ev sed sal e ku ji aliyê dewleta Tirk ve polîtîkayeke tunekirin û tunehesibandinê heye. Di heman demê de polîtîkayeke pişaftinê ya kûr heye. Di warê çandî, zimanî bi giştî nasnameyî armanc û polîtîkeyek dijwar a berbiçav û ya veşarî heye. Li pêşberî vê yekê jî bêguman têkoşîn û xwe parastina gelê Kurd heye. Lê mixabin mirov nikare bêje serkeftî ye. Di encama polîtîkaya pişaftinê ya dewletê xwe pişaftin jî li pêş e. Rewşa perweredeya bi zimanê Kurdî li holê ye. Hêj li ser qursan dimeşe. Belê li Amedê dibistaneke azad heye lê daxwaza perwerdeya bi zimanê Kurdî ya di vê dibistanê de qels e. Lê belê di warê siyasî de ji bo perwerdehiya bi zimanê Kurdî têkoşînek heye. Tê armanckirin ku dewlet perwerdeya bi zimanê Kurdî bipejirîne û zimanê Kurdî bibe zimanê perwerdehiyê. Di heman demê de têkoşîneke ji bo statuya Kurdî heye. Bi taybetî jî di vê pêvajoya ku li ser "Banga Aştî û Civaka Demokratîk" de ya ku ji aliyê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ve tê meşandin, daxwaz û hewildanên ji bo zimanê Kurdî zêdetir li ber çavan e.



**-Bi çend xêzan xwe bide naskirin, di nav de kurtejiyan, xwendin, hemû berjemên te?**

Li bajarê Amedê mezin bûme û ji zarokatiya xwe ve ye bi awayekî min di nav Têkoşîna Azadiya Kurdistanê de cihê xwe girtiye. Di temenê xwe yê piçûk de min dewleta Tirk û tuniya wê ya li ser gelê Kurd dît û naskir. Gelek caran hatim binçvakirin û girtin, rastî îşkenceyan hatim. Ji ber xebatên xwe yên rojnamegeriyê di sala 2009'an de hatim girtin û rastî cezayê endamtiya rêxistinê hatim. Heta sala sala 2012'yan li Zindana Amedê girtî mam. Dîsa ji ber xebatên xwe di salên 2016-2017'an de hatim girtin û li Zindana Amedê girtî mam. Herî dawî di sala 2022'yan de di encama operasyoneke mezin a li dijî Çapemeniya Azad a Kurd li gel 16 rojnamegeran hatim girtin. Di vê girtina xwe ya dawî de jî 13 mehan dîsa li Zindana Amedê girtî mam. Niha jî derbarê min de de gelek dozên ku hatine vekirin û ji wan ên ku têm darizandin hene. Ez 18 sal in rojnamegeriyê dikim û di jiyana xwe ya rojnamegerî de min her tim ji bo rojname û kovarên Kurdî nivîsiye. Di xebata xwe ya rojnamegeriyê de bi giranî li ser çand, dîrok û baweriyan radiwestim û di vê qadê de xwendin û lêkolînên min hene û çê dibin. Di Rojnameya Azadiya Welat, Ajansa DÎHA, Rojnameya Rojeva Medya, Rojnameya Welat, E-Rojname û Kovara Zrîng de min rojnamegerî kir û niha jî yek ji edîtorê Rojnameya Xwebûnê me. Dîsa ji bo Rojnameya Ronahî jî ev du salin hewil didim ku ji 15 rojan carekê li ser civakê binivîsim. Herwiha demekê min ji Stêrk TV û Gun Radyoyê re bername çêkir û niha jî car caran bernameyên taybet ên Stêrk TV'yê çêdikim.



## Kirîza hunerê di kirîza mirovahiyê de veşartî ye

**Remezan Olçen**

Li seranserê cîhanê ji ber bêrehmiya pergala serdest a sermayedar krîzeke mezin a civakî, xwezayî heye. Civak, xweza hatiye edimandin. Derûniya jiyanê hatiye xerakirin. Li her aliyekî cîhanê hikûmdarekî megeloman li ser post rûniştiye û bi qedera jiyanê dilîze. Niha jî behsa tecrûbekirina çekên nû yên nukleerî dikin. Ev hemû bûne çavkaniya krîza mirovahiyê ku krîza hunerê jî di vir de veşartî ye.

Rêber Apo dibêje: te çi li ku winda kir li wê derê lê bigere. Motto û şîara me divê ev be. Hingê em ê bikaribin çareseyekî bibînin û ji vê rewşa ku jiyanê bênefes dihêle derkevin. Te dî huner rola xwe ya esasî xitaba li dil û mêjî ye. Bi rêya hestan ew deriyên nû li ber mirov vedike. Dibêje: dinya yek e derî hezar.

Tevî vê rewşê jî em dibînin li cîhanê derketina ji rewşa krîza di hunerê de bi rêya dahênena formên nû tê tecrûbekirin. Helbet lêgerîn baş e, feydeya xwe jî heye. Lê ev ne sûreta meselê ye. JI bo mirovahî û huner ji krîzê derkevin pêdivê bi jinûveavakirina jiyanê heye. Huner aksiyomeke di nav komeke hunermend, rewşenbîr û ronakbîran de nîne. Îmtiyazeke wisa ya teng çênake. Erê li cîhanê bi riya endustrîkirina hunerê ev rewş heta radeyekê rûniştibe jî em dibînin bi xwe re fiyaskoyên çawa tîne. Lewre huner celebeke xweparastina civakê ye, têkoşîna ji bo hebûnê ye. Huner hebûnê dikemilîne hebûnê çêdike. Dinya bi pergala serdest a sermayedar bûye sergo, di bin giraniya vê sergoyê de diecige, diperçiqe. Îcar em pêşiyaz dikin ku bi rêya dengê gel a di hunerê de xwe dayî der wê sergo bê guhertin bibe gulzar û lalezar.

Ji bo wê jî mirov nikare di vî zemanî de hunermend di pozîsyona çavdêr de bibîne û wisa qebûl bike. Yan jî karê xwe tenê hilberandina hunerê jî nîne. Te dî rehmetiyê Yilmaz Guney beriya bi salan di axaftineke xwe de dibêje; "Saza destê me hewce ye weke çekê kar bike." Ez di vû gotinê de li ser rola huner û hunermend pir tiştan dibînim û fêm dikim. Nexwe hunermend berxwedana ji bo hebûnê vediguherîen zimanekî etîk û estetîk.

Îcar di vir de em ê weke ku bi awêneyekê li xwe binêrin li civaka xwe binêrin. Li cografya Rojhilata Navîn em Kurd ji bo hebûnê têdikoşin. Îro ro hebûna êdî mîsoger bûyî dewa azadiay xwe dike. Ev azadî jî tenê azadiyeke siyasî nîne. Ez wisa yeqîn dikim ev azadî di heman demê de ji nû ve avakirina wijdanê etîk û estetîk a mirovahiya derbxwarî ye. Hingê huner dibe zimanê wijdanê û bîranîna û veguheztina vê têkoşînê. Huner manedana jiyanê ye lê di vê serdema bêrehm a sermayedar de mane, wate hatiye qetilkirin. Ev pergal dil û mêjî kor kiriye. Dîtina çareyekî ji bo vê korbûn û tevizînê bawer dikim wê bi rêya manîfestoyeke nû ya hunerî be ku ev weke erkek eli pêş hunermendên vî gelê şoreşger.

# ‘Dewleta Tirk neçar e ku gelê Kurd û nasnameya wan qebûl bike’

Dayika Aştyê ya Bakurê Kurdistanê Qudret Eryilmaz diyar kir ku baweriya wan heya dawî bi Tevgera Azadiyê û Rêberê gelan Abdullah Ocalan heya û got, “Êdî dewleta Tirk mecbûr e gavên erênî biavêje, di heman demê de gelê Kurd û nasnameya Kurdî bi awayekî fermî qebûl bike.”

**Birûc Resûl**

Di 26`ê Cotmehê de Rêveberiya Tevgera Azadiyê bi daxuyaniyekê ragihand ku ew hemû hêzên xwe yên li nav sînorên Tirkiyê, li cihên ku rîska pevçûnê çêdike û rê li ber provokasyonên muhtemel vedike, ji bo pêkanîna vekişandina li Qadên Parastina Medyayê li ser erêkirina Rêber Abdullah Ocalan pêk tînin. Di daxuyaniyê de hate gotin ku beşek ji koman gihîştine Qadên Parastina Medyayê û ew kom beşdarî daxuyaniyê bûn. Li gorî ku bi erêkirina Rêber Abdullah Ocalan re, Tevgera Azadiyê gavên dîrokî avêtin, lê heya niha dewleta Tirk a dagirker tu gavên erênî ji bo pêkanîna aştî û demokratîk ne hatiye avêtin. Di vê çarçoveyê de Dayika Aştyê ya Bakurê Kurdistanê Qudret Eryilmaz ji Rojnameya me re axivî.



**‘Heya roja îro ji bo aştiyê tenê Tevgera Azadiyê gav diavêje’**

Qudret Eryilmaz da zanîn ku ev gava duyemîn e ku ji aliyê Tevgera Azadiyê ve tê avêtin û wiha got: “Di 27’ê Sibata 2025`an de panga Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk hate ragihandin, herwiha li hemû cîhanê deng veda. Bêguman Rêber Apo ji bo alozî û pirsgirêkên di Rojhilata Navîn de, banga Aştî û Civaka Demokratîk çareserî dît. Ji ber vê yekê piştî banga Rêber Apo gelek guhertin û veguhertin hatin çêkirin û heya roja îro em di nava pêvajoyekê guhertinê de ne. Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) di çarçove û pêkanîna ‘Banga Aştî û Civaka Demokratîk’ de Kongreya xwe ya 12`mîn a Awarte di navbera 5-7`ê Gulanê de li Herêmên Parastinê yên Medyayê pêk anî. Di kongrê de gava dîrokî ya yekem hat avêtin, ew jî fesxkirina Partiya Karkerên Kurdistan PKK hat ragihandin. Partiya me ne partiyeke ku wiha bi hesanî xwe fesix bike, lê belê ji bo pêkanîn û xwedîderketina baga Rêber Apo ev gav hat avêtin. Herwiha 30 gerîlayên PKK’ê di 11’ê Tîrmehê de bi merasîmekê çekên xwe şewitandin. Wek tê zanîn ku di 26`Cotmehê de ji aliyê Tevgera Azadiyê ve bi daxuyaniyekî fermî ragihand ku ew hemû hêzên xwe yên li nav sînorên Tirkiyê vekşîne, heya niha ji bo pêkanîna Aştî û Civaka Demokratîk gavên dîrokî ji aliyê Tevgera Azadiyê ve tê avêtin, da ku ew hincetên dewleta Tirk nemîne, her care dibêjie pêwîst e Tevgera Azadiyê vê gevê bavêje û wiha bike. Lê niha ti hincet nema ku xwe bixapîne. Niha jî yê ku pêwîst e gavên cidî bide avêtin dewleta Tirke.”

**‘Zarokên me ne berxên li ber kêrê ne’**

Qudret di berdwamiya axaftina xwe de wiha anî ziman: “Bêguman ev gava dîrokî ya duyemîn dîsa ji aliyê Rêber apo ve hat avêtin, helbet baweriya me heya dawî bi rêxistin û Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan heye, pişta me bi wan rast û saxleme. lê em vê jî tekez dikin ku kevokek bi baskekî nikare bifre, pêwîst e dewleta Tirk jî gav biavêje, da ku aştî pêk were, ji ber ku heya dewleta Tirk gav neavêje wê baweriya me bi wê tune be. Heya roja îro bi hezaran nexweş û zarokên me di zindanan de ne û ew derfeta wan azad bike nade, gava yekem divê dewleta Tirk hemê zarok û hevalên me ji zindanan derxe. dewleta Tirk her dinava mercan de ye, dibêje pêwîste PKK`ê çekan deyine û ji çiyayên Bakur derkevin, di heman demê de dibêje pêwîst e hêzên Rojavayê Kurdistanê jî çekan deyne. Lê bila deweleta Tirk vê jî bizanbe ku zarokên me ne berxên li ber kêrê ne. Baweriya me bi dewleta Tirk tuneye, her li ser kurdan êriş, kuştin, binçavkirin û zilim died meşandin. ji ber vê yekê wê parastin ji bo me girîng be. Çawa ku dewleta Tirk pêdiviyê xwe li jiyankirinê dibîne, helbet bêdviyê me jî bi dunya û jiyankirinê heya. Bila me kêm nebîne û me qebûl bike, ji ber ku dewleta Tirk îro ew axa me dagirkiriya, û mafê me daya xwarin. Ji ber vê yekê tu mafê wî tuneya me nede qebûlkirin.”

**‘Êdî dewleta Tirk mecbûr e gelê Kurd û nasnameya me qebûl bike’**

Dayika Aştiyê ya Bakurê Kurdistanê Qudret Eryilmaz di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku dewleta Tirk mecbûr e me û masnameya me qebûl bike û wiha doman: “Piştî ku Rêber Apo û Tevgera Azadiyê gavên dîrokî avêtin, êdî dewleta Tirk mecbûr e gavên erênî bavêje, di heman demê de ku gelê Kurd û nasnameya kurdî bi awayekî fermî qebûl bike. Niha tu hinceta dewleta Tirk nema. Em dibêjin bese ji zilm û zorê re, êdî bila aştî û demokratîk pêk were, dayik jî kezebên wan şewitîn, pêwîst e ev kîn û nefret ji hole rabe. Bi vê wesîleyê di serî de jin û ciwan, em bang li gelê xwe, hêzên demokratîk û sosyalîst û siyasetmedaran dikin ku xwedî li vê pêvajoya dîrokî derbikevin; ji bo azadiya Rêber Apo û çareseriya demokratîk a pirsgirêka Kurd piştevaniyeke hîn xurtir nîşan bidin.”

# Li Efrînê zimanê Kurdî ji sîstema xwendinê tê rakirin

**Zana Roj/Qamişlo**

**Di çarçoveya kiryarên dagirkeriyê yên derbarê tunekirina nasnameya Kurdî di Efrînê de, Wezareta Perwerdê ya hikumeta veguhêz xwendina zimanê Kurdî qedexe kiriye û li şûna wê zimanê Ferensî daniye. Rûxmî ku zimanê Kurdî ji dema Rêveberiya Xweser û heyanî hatina Hikumeta veguhêz heta sala 2024’an berdewam dikir.**




Kiryarên dagirkereiyê li ser herêmên dagirkirinî di aliyê qirkirina etnîkî, nasname û guhartina cografîk de, ji dema dagirkirina Herêma Efrînê ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê ve di sala 2018’an de bi hovîtî berdewam dikin. Di vê çarçoveyê de gel di dirêjahiya 7 salan ji bin kiryar û hovîtiya dagirkeriyê derneketin. Ev yek li dijî tunekirina hebûn û nasnameya Kurdewarî a herêmê tê birêvebirin. Helbet ev polîtîka di asta yekemîn de ji aliyê hişmendiya dewleta Tirk a faşîst ve dihat birêve birin. Di asta giştî de dagirkerî dewleta Tirkiyê ye û di aliyê pêkanîna hemû cureyên binpêkirinên dijmirovî ji qetikirin, revandin, îşkencekirin, tecawîzkirin, girtin û talankirinê; Komên çeteyan yên ku ji laiyê dewleta Tirkiyê ve hatine xwedîkirin ve, pêk dihatin. Ev yek jî heyanî vê kêliyê li ser gelê resen tê domandin.

Piştî dagirkirinê qaşo partiyên Siyasî yên Kurd alîgirên Tirkiyê û komên çeteyan, berdewamkirina xwendina zimanê Kurdî parastin. Helbet ev ne pîvan bû ku li wê derê çand û zimanê gel wê parastî bimîne, ji ber sîstema ku di dema Rêverberiya Xweser de dihate xwendindin sîstemeke bi temamî li ser esasê danîna perwerdeya dipistanan bi zimanê Kurdî bû tevî, Babetên zimanê Erebî û Ingilîzî. Lê belê piştî dagirkirina Efrînê ev yek bi temamê hat rakirin û li şûna wê sîstema xwendinê a Tirkiyê hat danîn ku xwendina zimanê Tikî bû zimanekî fermî di bin siya dakirkirinê de.

Piştî hilweşîna Rêjîma Baas û hatina HTŞ’ê ango hikumeta veguhêz di Çileya 2024’an de, ev kiryar bi tundî dom kirin û tu guhertinek di aliyê rewşa gel û herêmê de nehat teysandin. Vê carê di Cotmeha sala 2025’an de Wezareta Perwerdeyê ya hikumeta veguhêz piryar da ku zimanê Kurdî bi temamî di herêma Efrînê de tê qedexekirin. Ev yek vê tekez dike ku hikumeta veguhêz rewakirina dagkeriya Tirkiyê dipejrîne, her wiha tunekirina nasnameya Kurdî ku herêmek ji sedî 97 Kurdî bû, bi van polîtîke û biryaran tune dike.

**Di vê derbarê de Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriye ev dabû ragihandin:**

Piştî ku zimanê Kurdî li bajarê Efrîn bû zimanekî fermî ku di dema Rêveberiya Xweser de piştî 2012’an heta dagirkirina wê di Adara 2018’an de di mufredatên dibistanan de dihat hînkirin. Piştî wê, zimanê Kurdî di dibistanên Efrîn de heftê de 2-4 saetan dihat fêrkirin.

Niha piştî hilweşna Rêjîma Baas û hatina desthilatdariya hikumeta veguhêz, Rêveberiya herêma Afrînê, li gorî biryara dawî ya Wezareta Perwerdehiyê ya Sûriyeyê, vê dawiyê hînkirina zimanê Kurdî li dibistan û sîstema bajarê Afrînê betal kir û li şûna wê zimanekî biyanî, bi taybetî Fransî, danî.

Di nav qurbaniyên vê biryara neheq de, mehrûmkirina bi hezaran xwendekar û zarokan ji hînkirin û fêrbûna bi zimanê xwe yê dayikê Kurdî. Taybet ew kesên ku vê dawiyê ji deverên Rêveberiya Xweser vegeriyane û bi zimanê xwe yê dayikê yê sereke Kurdî dixwandin. Bi vê yekê re derveyî refên xwendinê man. Zanîngeha Gazîantepê ya Tirkiyê li bajarê Efrîn jî biryara xwe ya dawî ya qebûlkirina qeydkirina xwendekarên ku bawernameyên xwe ji Desteya Perwerdehiyê ya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê wergirtine, vekişand. Piştî ku di destpêka vê salê de erêkirina xwe ya qeydkirina wan li zanîngehê û berhevkirina xercên xwendina wan ragihand, niha biryara xwe ya qebûlkirina wan paşve kişandiye, û bi sedan xwendekar ji xwendin û perwerdeyê bêpar hiştiye.

Parêzgarê Helebê Ezzem Xerîb di serdana xwe ya dawî ya ji bo Efrînê de, biryara rakirina zimanê Kurdî ji dibistanan bi wê yekê rewa kir ku ew biryareke siyasî ye ku dikare bi demê re were çareserkirin.

Biryareke wiha neheq û bêedalet e li hember bi hezaran Kurdan ku ji perwerdehiya bi zimanê dayikê bêpar in. Ev biryar di heman demê de di çarçoveya jiholêrakirina nasnameya neteweyî ya çandî (kurdî) ya herêma Efrîn de tê.

Hêjayî gotinê ye ku hejmara mamosteyên zimanê Kurdî li herêma Efrîn di navbera (300-400) mamosteyên mêr û jin de diguhere ku niha li şûna zimanê Kurdî, mijarên din ên wekî (werzîş - wênesazî - xetnivîsî – muzîk) têne erkdarkirin.




# ‘Zimanê çapemeniya dewletê ne zimanê demokrasiyê ye’

Rojnamevan Zeynep Durgut destnîşan kir ku di sedsala 21'emîn de çapemenî weke hêza cîhanî ya yekem tê pênasekirin, ji ber wê di guhertin û veguhertina civak, gel û netewan de roleke esasî û dîrokî dilîze. Herwiha Zeynep Durgun diyar kir ku di pêkanîna armanca pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de, çapemenî roleke mezin dilîze û di pêkanîna demokrasiyê de jî xwedî ciheke girîng e.

**Amara Baran**

Di derbarên kiryarên dewleta Tirk yên li ser Rojnamevanan Di van salên dawiyê de, li Bakurê Kurdistanê, rewşa çapemeniyê azad bi awayekî aşkere nîşan dide ku mafê ragihandinê hîn jî di bin xetereyê de ye. Rojnamevan Zeynep Durgut bersiva pirsê Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha ye.



**-Li Bakurê Kurdistanê ji liyê dewleta Tirk ve binpêkirinên li ser rojnamevanan her roj zêde dibin, hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Ji salên 90’an vir bi taybetî jî êrişên li ser çapemeniya azad her tim hebûn. Ev êriş tu carî kêm nebûn. Di van salên dawiyê de, li Bakurê Kurdistanê, rewşa çapemeniyê azad bi awayekî aşkere nîşan dide ku mafê ragihandinê hîn jî di bin xetereyê de ye. Rojnamevan û medyayên serbixwe, bi taybetî yên ku derbarê binpêkirina mafên mirovan jî li ser mijarên siyasî dixebitin, gelek caran bi rêbazên cûda rastî êrişan tên. Rojnameger ne tenê rastî êrişên dewletê yê girtin û sansûrê tên, di heman demê de bi gefên mirinê re jî rû bi rû dimînin. Li bakur kontrola siyasî ya li ser medyayê pir zêde ye. Qanûn û pergalên dadgehî yê ku divê parastina azadiya ragihandinê bikin, berovajî vê dikin. Rojnamegerên ku heqîqetê dinivîsin û bi raya giştî re parve dikin tên cezakirin û der barê wan de lêpirsîn û doz tên vekirin. Helbet ev rewş bandoreke neyînî li ser civakê jî dike. Dema ku nûçe û agahî di bin kontrola hêzên siyasî û desthilatdariyê de dimîne civak jî ji rastiyê dûr dikeve û bi vî awayî mafê civakê yê rastî hînbûn û agahdarbûnê tê binpêkirin. Êrişên li dijî çapemeniyê ne tenê binpêkirina mafê rojnamegeriyê ye. Dema ku çapemenî nekarî bi awayek azad nûçe bikişîne û raya giştî re parve bike civak ji rastiyê bêpar dimîne. Şaşitî çi be wê dizane û bi wê şaşitiyê re pêşerojê saz dike. Di hiş de teslimiyet çêdibe Yek ji armancên van êrişan jî ew e ku civak di taritiya ku tê de difetise rastiyê nebine. Ji ber wê heta ku heqîqet ragihandin azad nebe nepêkane ye ku em qala civakeke demokratik jî bikin. Desthilatdariya heyî dixwaze ku bi riya çapemeniyê civakê bêdeng bike. Çimkî dizane ku yê ku civakê têxe lîv û tevgerê çapemeniye. Ji ber wê bi doz vekirinê, bi gef xwarinê, bi girtin û binçavkirinan hem dixwazin nûçeyên ku tên parvekirin îlegalîze bikin û hem jî wê têkiliya civakê û baweriya civakê ya bi taybetî jî li dijî çapemeniya azad bişkînin.



**-Ev yek wê çawa bandorê li ser pêvajoya aştî û civaka demokratîk bike?**

Di sedsala 21’emîn de çapemenî weke hêza cîhanî ya yekem tê pênasekirin. Ji ber wê di guhertin û veguhertina civakan, gelan û netewan de roleke esasî û dîrokî dilîze.Di pêkanîna armanca pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk a ku ji hêla Rêber Apo ve hatiye destpêkirin de, çapemenî roleke mezin dilîze û bi cihkirina demokrasiyê de jî xwedî ciheke girînge. Çapemenî çi binivîse û çawa ragihîne civak ji wê bawer dike. Dema ku em li çapemiya aligir dinerin em dibinin ku wî zimanê xwe yê terorî didomîne, hişê civakê şolî dike. Ew bi vî zimanê xwe civakê ji hev veqetîne. Û di nav civakê de koman diafirîne ku hem yên piştgirîya aştî û hem jî şer dikin çê dike. Ev pêvajoye hatiye destpêkirin heta niha di zimanê çapemeniya aligir de guhertin çênebû ye. Ji hêla desthilatdariyê ve jî ti mudexele nayên kirin. Berovajî wê çapemeniya azad yan jî hin rojnameger serbixwe yê ku piştgiriyê didin vê pêvajoyê rastî êrişan tên. Ji ber wê heke ku armanca dewletê ya sereke û ya esasî bi rastî jî “aşitî” ya bi gelan re be divê ku destpêkê vî zimanê ku civakê jehrî dike biguherîne. Di vê pêvajoyê de dilsoziya dewletê zimanê çapemeniyê ye. Bila dewlet destpêkê zimanê çapemeniya xwe sererast bike. Ev ziman ne zimanê aşitiyê ye, ev ziman ne zimanê demokrasiyê ye û ev ziman ne zimanê avakirina jiyaneke nû ya wekheve. Ev ziman ji hev dûr dixe, ev êrişên li ser çapemeniya azad a astengkirin û xetimandina vê pêvajoyê ye. Ji ber vê yekê, berî her tiştî, divê zimanekî çapemeniyê yê demokratîk were afirandin. Ev pêvajoye encax bi vî zimanî dikare biserbikeve. Heke ku hûn zimanê ku xîzmetê ji vê pêvajoyê re dike bêdeng bikin û yê ku pêvajoyê jehrî dikin jî azad bihêlin nepêkane ye ku civak demokratik bibe û aşitiyeke mayinde jî pêk were.

**-Di vê Pêvajoyê de armanca dewleta Tirk çiye ku van kiryaran li ser Rojnamevanan dike ?**

Bi bêdengkirin û îlegalîzekirina çapemeniya azad, dewlet dixwaze civakê bixe di bin kontrola xwe de. Dixwaze civakê qanihî gotinên xwe bike. Hewl dide xwe wekî qehremanê pêvajoyê nîşan bide. Hewl dide civakê qanih bike ku wê “Tirkiyeyek bê teror” ava kiriye. Bi terorîzekirina Kurdan, vê yekê wekî destkeftiya xwe pêşkêşî raya giştî dike.Û vê yekê bi êrîşkirina ser çapemeniya azad dike.Dewleta tirk hewl dide ku têgihîştina civakê biguherîne. Dema ku mirov bala xwe didê her tim di ragihandinên xwe de pêvajo weke ku wan daye destpêkirin û weke ku tevgera kurd nêçar maye didin nîşandin. Heta ku di pêngava dîrokî ya PKK’ê jî weke teslimiyet didin. Hewl didin ku civak jî bi vê yekê bawer bike. Desthilatdariya AKP’ê kirinên xwe yên 23 salan dê nikaribe bi vê pêvajoyê bide jibîrkirin. Gel dizane baweriya xwe bi kê bîne. Ev hemû êrîş û hewldanên bêdengkirina wan nîşan didin ku gel êdî baweriya xwe bi wan nayne, bi çapemeniya wan a aligir nayîne. Niha, AKP siyaseteke hevsengiyê dimeşîne. Lê gel baweriya xwe bi Rêber Apo tîne û bi bawerin ku ev pêvajo bi hewledayinên wî, keda wî û nexşeraya wî ya nû dê bi serbikeve.

**-Hûn wek rojnemevan we çi gavan avêtiye, ji bo ku ev kiryar bên rawestandin Erka ku dikeve ser milê Rojnamevanan çiye?**

Heta niha, der heqê me de bi dehan lêpirsîn, doz hatin vekirin û em gelek caran hatine binçavkirin û gef li me hatiye xwarin. Lêbelê, di nivîsandina rastiyê de û ragihandina heqîqetê de me tu caran gav paşve neavêt. Ji ber ku em dizanin rêya avakirina civakeke aşitî û demokratîk nivîsandina rastiyê ye.Em rojnamegeriya aştiyê dikin. Her ku êrîş zêde dibin, em bêtir bawer dikin ku em rast in û di rastî nivîsandinê de bêtir israr dikin. Bersiva me ya ji van êrîşan re ew e ku em bêtir nûçeyan binivîsin û bêtir bixebitin.

**-Gelo we têkilî bi ti aliyên navnetewî yê ragihandinê re kiriye, û bersiva wan çi bû?**

Belê, dema ku em rastî êrîş û binçavkirinan tên, rêxistinên rojnamevanan ên navneteweyî bi me re têkilî datînin û piştevaniya xwe pêşkêş dikin. Lê ev têrê nake. Ji bo vê pêvajoyê piştevanî tenê têrê nake. Bêyî ku em xwedî kîjan bîrdoziyê bin divê em rojnamegeriya rastîn biparêzin û ji bo wê jî tebikoşin. Ji bo vê yekê jî divê ku em hîn bêtir bibin tifaq û vê yekitiyê li cih û deverên cûrbecûr bi dengekî bilind bînin ziman.

# ‘Çeteyên biyanî Sûriyê ber bi wêraniyê ve dibin’

Rojnamevan Dilyar Cizîrî diyar kir ku bi hezaran çeteyên biyanî di ser Tirkiyê re hatine Sûriyê û niha bi fermana Tirkiyê tevdigerin, ev jî wê metirsiya şerekî navxweyî mezin bike û aloziya civakî kûrtir bike û got, “Dosya çeteyên biyanî bi destê dewleta Tirk tên livandin."

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Bi destpêkirina şerê navxweyê yê li Sûriyê, bi hezaran çeteyên biyanî di bin navê cîhadê de berê xwe dan Sûriyê. Van komên çete di bin gelek navan de xwe bi rêxistin kirin. Piraniya wan jî bi banga DAIŞ’ê li ser Tirkiyê re derbasî Sûriyê hatin kirin. Van çeteyan di pêvajoya şer de li dijî gelên Sûriyê gelek sûc û hovîtî pêk anîn. Piraniya van çeteyan ji herêma Ûygur ya Çînê, ji herêma Çeçenistan ya Rûsyayê, Ozbekistanê, Tacikîstanê, Albanyayê, Tirkiyê, welatên Ewropa û welatên Ereb in.

### Çeteyên biyanî bi armanca avakirina “Dewleta Xîlafetê” hatin Sûriyê

Piraniya çeteyên biyanî bi destpêka aloziya Sûriyê re li ser banga DAIŞ’ê û bi armanca avakirina “Dewleta Xîlafetê” hatin Sûriyê. Lê piştî tunekirina DAIŞ’ê piraniya wan beşdarî hikumeta veguhêz bûn. Hinan jî komên çekdar ên herêmî ava kirin û ew jî di bin sîwana hikumeta veguhêz de tev digerin. Çeteyên biyanî yên li Sûriyê ji van welatan in: Uygur (Tirkistan) ji Çînê ne: Ew koma herî mezin e, piraniya wan di nava hikumeta veguhêz de cih girtiye. Çeçen: Fermandar û çekdarên ji Rûsyayê ne. Ereb: Ji welatên Kendavê, Urdin, Misir, Tunis û Mexribê ne. Ewropa: Ji Fransa, Brîtanya û Almanyayê ne û hejmara wan niha kêm e. Hejmareke pir a wan vegeriyan welatên xwe. Hejmareke din ji Ozbekistan, Tacîkistan, Tirkiye û Albanyayê ne. Hejmarek ji welatên din ên cuda jî hene.

### Piraniya binpêkirinên li Sûriyê bi destê çeteyên biyanî ne

Tê texmînkirin ku hejmar nêzî 6 hezarî ye. Li gorî hin raporan hejmara çeteyên biyanî li Sûriyê ji sedî 30’ê ji HTŞ’ê ne. Bi hilweşîna rejîma Baasê re, çeteyên biyanî li herêmeke berfireh belav bûn û ji gundewarên Idlib û Helebê ber bi herêmên din ên Sûriyê ve derketin. Beşeke wan li gundên Ceblê yên Laziqiyê bi cih bûn. Beşeke din li herêmên din ên Laziqiyê û li nêzî gundê El Hemîdiye yê li başûrê Tertûs, beşeka wan jî li nêzî Şamê û gundên Hums û Hemayê bi cih bûne. Beşeke din jî cihê xwe li Idlib û Helebê girtin. Çeteyên biyanî baregeh û navendên rejîma berê yên leşkerî wek bargehên xwe bi kar anîn. Piraniya binpêkirin, sûc, sorkirin, revandin û talan bi wan ve tê girêdan. Hebûna wan li Idlib û Helebê jî didome.

### Tirkiyê sînor li pêşiya çeteyên biyanî vekir û vedike

Çeteyên DAIŞ’ê û berpirsên Cebhet El Nusra (HTŞ ya niha) berê roleke mezin di erkdarkirina çeteyên biyanî û anîna wan de lîstiye. Di hemû rewşan de derbasbûna wan di Tirkiyê re çêdibû. Tirkiyê sînorê xwe ji çeteyan re vekir. Ew bi rêya balafirxaneyên xwe anîn û berê wan da Sûriyê. Bi dehan belge û mikurhatinên çeteyan di vê derbarê de hatine weşandin. Gelek belgeyên din îsbat dikin ku dewleta Tirk li pişt derbaskirina çeteyan e. Yên pasportên wan mohra Tirkiyê li ser hene jî, hatine eşkerekirin. Ev îsbat dike ku dewleta Tirk ji wan re rê vedike. Bi avakirina Wezareta Parastinê ya hikumeta veguhêz a Sûriyê re çeteyên biyanî li tugayên leşkerî yên artêşê hatin belavkirin.

### Hikumeta veguhêz ber bi nasnamekirina çeteyên biyanî ve diçe

Hikumeta veguhêz a Sûriyê ji bo hebûna çeteyên biyan li Sûriyê fermî bike, kar da meşandin. Di fermandariya bilind de rol da wan. Hin ji wan di desthildariyê de erk girtin. Ev di qadên siyasî û leşkerî de. Li ser wan karê dewletê û rêxistinkirina dema veguhêz bi rê ve diçe. Di heman demê de hewil didin di rêya wan re civakê ji nû ve rêxistin bikin. Hikumeta veguhêz ber bi nasnamekirina çeteyên biyanî ve diçe. Ev gav bi taybet piştî Serokê Veghêz ê Sûriyê Ehmed El Şeri di 18’ê kanûna sala 2024’an de got:“Çekdarên biyanî roleke mezin di hilweşandina rejîma Esed de girtin. Hêjane em wan xelat bikin.”

Dosya dayîna nasnameyê ji çeteyên biyanî yên li Sûriyê bûne mijara nîqaşên berfireh. Piştî wan fermî daxwazname ji hikumetê re pêşkêş kir. Tê de daxwaz wergritina nasnameya Sûriyê dikin. Ev mijar metirsiyeke mezin di nava gelê Sûriyê de ava kiriye. Dibêjin ev gav dê nasnameya Sûriyê careke din li ser esasê baweriyan xêz bike.

### Domandina xeteriya çeteyên biyanî li Sûriyê

Piştî hilweşîna rejima Baas û hatin Hikumeta veguhêz ya li ser desthilatê xeteriya van çeteyan hê jî dewam dike. Herwiha di van demên dawiyê de mijara nasnameya dayîna van çeteyan di rojevê de ye.

### Çeteyên biyanî di asta payebilind de hatine erkedarkirin

Herî dawî eşkere bû ku ev çete nasnameyê werdigirin. Li gorî Çavdêriya Mafên Mirovan ya Sûriyê rojane di navbera 30 û 50 kes tên bi nasnamekirin. Heta niha gelek çeteyan jî di nava hêzên hikumeta veguhêz ya Sûriyê de di asta payebilind de hatine erkedarkirin.

### 6 hezar çekdarên biyanî li Sûriyê ne

Li aliyê din hate ragihandin ku Wezareta Parastinê ya hikumeta veguhêz amadekariyên avakirina tugayên taybet ji bo çeteyên Uygur dike. Bi avakirina Wezareta Parastinê ya hikumeta veguhêz a Sûriyê re hejmara çeteyên biyanî li tugayên leşkerî hatin belavkirin. wiha ne:

Partiya Îslamî ya Tirkistanî 2 hezar û 500

Ensar El Tewhîd 200

Ecnad El Qoqaz 250

El Şîşan (Ecnad El Şam) 300

Derbarê şerê navxweyî yê di navbera çeteyên biyanî û hikumeta veguhêz de, Rojnamevan Dilyar Cizîrî ji Rojnameya me re axivî.

### ‘Piştevaniya dewleta Tirk ji çeteyên biyanî re eşkere ye’

Dilyar Cizîrî da zanîn ku piştevaniya dewleta Tirk ji çeteyên biyanî re zelal e û wiha got: “ Di şeva 21’ê cotmehê de nûçeya aloziyê di navbera çeteyên biyanî yên Feransî û hêzên hikûmeta veguhêz de belav bû. Bûyer li kampeke nêzî bajarê Harim a bakur-rojavayê Idlibê pêk hat. Di kampê de tugaya “El Xurebai” a serçeteyê Feransî yê ji eslê xwe ji Senîgal Umer Omsen fermandariya wê dike, hatine bi cihkirin. Ev tugay bi salane di bin fermandariya HTŞ’ê li herêmên Idlibê tevdiger bi hejmarek çeteyên Fransî tê de cih digrin. Tişta herî zêde balkêş ew e ku kampa behsa mijarê tam li ser sînorê Tirkiyê û Sûriyê ye. Ev jî piştevaniya dewleta Tirk ji van çeteyan re nîşan dide.

Piştî bûyerê hate îdakirin ku hikumeta veguhêz a Sûriyê li ser bûyera revandina jinê ku ji aliyê secrete Umer Osmen pêk hatiye. Îda dibêje hikumeta veguhêz bi îdaya revandina jinan, ji Osmen xwestiye xwe radestî wan bike, wî daxwaza wan red kiriye. Li ser wê di navbera herdû aliyan de şer derketiye. Hate gotin şerekî dijwar di navbera herdû aliyan de rû da. Çiqasî raste jî ne diyare. Paşê çeteyên Ozbekî navnênkarî kirin û şer rawestiye. Ev di encama lihevkirinekê de pêk hat. Di vê bûyerê de gumanên min hene, ihtîmaleke mezin ev tevgera HTŞ’ê planeke di rêya wê re ji civaka navdewletî û di serî de Amerîka û Fransa re bêje, va em şerê çeteyên biyanî dikin. Em tevgera wan sînordar dikin. Ev jî hewldaneke xwe ku civaka navdewletî pê bixapîne. Ihtîmaleke din jî dibe nakokiyên rêveberiya hikumeta veguhêz piştî hatina ser desthiladariyê zêde bûne. Lê ji ber komên biyanî û bi taybet ên Ozbek, Ugor, Tirkistan û her wekî din, di bin fermana istxbarata Tirkiyê de tevdigerin, wan ne hiştiye şer mezin bibe. Zext li her du aliyan kiribe, da dawî li şer bîne.”



### ‘Dosya çeteyên biyanî bi destê dewleta Tirk tê livandin’

Cizîrî di dewamkirina axaftina xwe de diyar kir ku di encama her du ihtîmalan de jî diyar dibe HTŞ’ê û Ehmed El Şeri di mijara çeteyên biyanî yên bi salane navendên sereke di desthilatê de girtin, ne xwedî biryare û wiha pê de çû: “Aliyê biryarê dide dewleta Tirk û istxbarata wê ye. Heger şerê navbera çeteyên biyanî û HTŞ’ê de ne planek be û em bêjin ihtîmala duyemîn rastir be, dewlet Tirk ne hişt şerê wan kûrtir bibe. Ji ber ew şer ne di berjewendiya dewleta Tirk de ye. Ew dizane heger şerê wan gûr bibe, ev dê bibe zemîneke din hêzên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û rola wê di avakirina artêşa nû ya Sûriyê de derkeve pêş. Ji ber wê jî dewleta Tirk naxwaze ne bi plan û ne jî bi rast şerê di navbera çeteyên hikumeta veguhêz’ê yên biyanî û yên herêmî de derkeve. Ev jî diyar dike heger ihtîmala yekem zêdetir nêzî rastiyê be, ev gav bêyî agahiya dewleta Tirk pêk hatiye. Di nerîna min de heger ne dewleta Tirk û hêza wê ya leşkerî ya di xaka Sûriyê de dibe şerê wan bi rastî derketiba. Ev dosya çeteyên biyanî bi destê dewleta Tirk tê livandin, ji ber wê derbeya li wan li dijî hebûna dewleta Tirk e.”

### ‘Wê çeteyên biyanî aloziya civakî kûrtir bikin’

Dilyar Cizîrî axaftina xwe wiha qedand: “Mjara nasname dayîna çeteyên biyanî sûceke welat ber bi wêraniyê ve dibe. Ev kesên tundrew in û destê wan di xwîna gelê Sûriyê de heye. Di vir de bi rastî mirov matmayî dimîne, dema mijar dibe Kurdên ji parçeyên din ên Kurdistanê hatine tevlî QSD’ê bûne ku hejmara wan dibêjin dive derkevin. Dema mijar dibe çeteyên biyanî yên berê di nava DAIŞ’ê de bûn, nasnameyan didin wan, ev nakokiye. Ev jî dewleta Tirk serkêşiya wê dike, dixwaze bi nasnamedayîna çeteyên ozbek, îgor û her wekî din hêza xwe ya civakî di Sûriyê de, ava bike. Bi hezaran çeteyên biyanî di ser Tirkiyê re hatine Sûriyê û niha bi fermana Tirkiyê tevdigerin. dewleta Tirk wan di pêkanîna projeyên xwe yên dem dirêj de bikar tîne. Ev metirsiya şerekî navxweyî mezin bikin û aloziya civakî kûrtir bikin.”



## Vekişana Gerîla!

**Ahmet Aktaş**

Tevgera Azadiya Kurdistanê, di 26 Cotmeha 2025’an de, bi civînek çapemeniyê, vekişana gerîla ji Tirkiyê, ber bi qadên parastinê medyayê ragihand.

Ev jî, gavek giring a nû a dewama pêngava pêvajoya çareseriyê ye.

Bi vê gavê re, divê êdî qonaxa 2’an a pêvajoyê dest pê bike.

Qonaxa yekê, her çendîn hêdî meşiya û gelek mijar bi derengî ketibûn jî, hinek gavên giring jî hatin avêtin.

Weke mînak:

Ji aliyê Tevgera Azadiyê ve, li ser banga Rêber APO ya 27’ê Sibatê, hema piştî wê bi rojekê di 1 Adarê de agirbest hat ragihandin û yek çalakiyek leşkerî rû neda.

Bi vê gava vekişandina gerila re, zemîna şer daket asta herî lawaz, ji ber ku bi xurtî bingeha provakasyonan ji holê hatin rakirin.

Ji aliyê dewletê ve, her çendîn paralelî Tevgera Azadiyê pêngav bi xurtî nehatibîn avêtin jî, hinek gavên erênî jî hene weke; avakirina Komisyona Parlemena Tirkiyê, rawestandina an kêmkirina êrîşên leşkerî û hwd.

Li ser vê gava nû, êdî zemînê despêkirina qonaxa 2’an a pêveajoyê gelek xweştir bû.

Di vê qonaxê de, weke ku di banga despêkê ya Rêber APO de hatibû gotin, divê bi lez pêdiviyên şaxê yasayî/huqûqî û siyaseta demokratî werin bicih anîn.

Ev kar jî, pêşî dikeve ser milê komisyon-parlemen û bi giştî mekanizmayên dewletê. Berî her tiştî divê Rêber APO azad bibe.

Heke ev gav neyên avêtin, zemînê provakasyonên piralî wê werin xweşkirin.

Hema, em hinek provakasyonên ku bûbûn sedemên xerakirina agirbest û pêvajoyên berê bînin bîra xwe; kuştina 33 eskerên li Çebaxçûrê, kuştina 2 polisên li Serêkaniyê û hwd.

Erê, çendîn zemînê provakasyonan lawaz bûbin jî, hinek aliyên derve û hundir û hinek dewletên berjewendên xwe di şer de dibînin hene, li benda valatiyekê ne, da ku vê pêvajoya çareseriyê jî xerab bikin.

Bi zaneyî an bi nezanî yên li dijî vê pêvajoyê hene, divê ev were dîtîn û pêşî li van xerabkaran werin girtin, loma divê him Tevgera Azadiyê û him bi giranî aliyên dewletê bi hişyarî û amadekariyên xurt û lezgîn tevbigerin.

Bi taybetî jî, divê zimanê negatif ê çapemeniyê û medyayê ku pêşiyê li provakasyonan vedikin, bi lez werin guhertin. Berevajî divê zimanê pozîtîf ê çêker were bikaranîn.

Şerd û mercên Rojhilata Navîn li ber çavan e ku çendîn ber bi şer û cenga berfireh diçe; him bi taybetî û him bi gelemperî.

Hemû dewletên hegemon, ji bo di cenga cîhanî ya 3yan de destên xwe xurt bikin, bi hemû hêza xwe ya siyasî, leşkerî, aborî û teknîkî, xwe li Rojhilata Navîn bicih dikin.

Weke piraniya şîrovekaran jî dibêjin; li vê herêmê welatê weke navend, xwedî erdnigariya jeopolitik a herî goncaw Kurdistan e û her wiha xwedî hêza herî mezin a hişmnedî û rêxistinî jî gelê Kurdistanê ye.

Rêber APO, aşkere ji her alî re û bi taybetî ji rayedarên dewleta Tirk re dibêje, “kî hevalbendiya gelê Kurdistanê bike, ew ê serkeftî be û wê, ji malxerabiya giran a şerê cîhanê 3yan, bi ziyana herî kêm rizgar bibe! Jixwe stratejiya nuh a Tevgêra Azadiyê tê zanîn, ne şerê çekdarî ye, siyaseta demokratî ye. Êdî herkes û zanebûn û xîreta xwe!



# Muslim: Divê dewleta Tirk gotinên xwe ji teoriyê derbasî piratîkê bike

Endamê Komîteya Hevserokatiya PYD'ê Salih Muslim diyar kir ku banga Rêber Apo û gavên dîrokî yên ku Tevgera Azadiyê avêtine tekez dike ku gelê Kurd, Tevgera Azadiyê û Rêber Apo aştî û aramiyê dixwazin, lewra ji bo serxistina pêvajoyê gelek qonax hene ku divê dewleta Tirk li ser raweste û gotinên xwe ji tewriyê derbasî piratîkê bike.

**Ronaz Silêman/Hesekê**

Derbarê pêşdebirina pêvajoya ku li ser banga Rêber Apo di 27’ê Sibata 2025’an de hate destpêkirin, herwiha gavên dîrokî ku ji aliyê Tevgera Azadiyê ve hatin avêtin, Endamê Komîteya Hevserokatiya Partiya Yekîtiya Demokrat PYD’ê Salih Muslim bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Piştî banga “Aştî û Civaka Demokratîk” a ku ji aliyê Rêber Apo ve hat kir, Tevgera Azadiyê gavên dîrokî yên çek îmhaikirinê û vekişandin ji sînorê Bakurê Kurdistanê avêt, win van gavê çawa dinirxînin?**

Rêber Apo û Tevgera Azadiya Kurdistanê ji berê de ji bo azadî û çareserkirina pirsgirêka gelê Kurd, herwiha ji bo tevahî gelên herêmê û gelên ku di bin desthilatdariyan de zilimkarî dibînin, xwe ji bo van hemû yan berpirsyar dibîne. Ji ber wê gelek caran gav avêtine, ne ji niha ve. Ji dema şerê çekdarî dest pê kiriye, pevçûn û ewqas xirabiyên çêbibûn, tim aliyê ku aştî û aramî xwestiye, gelê Kurd, pêşengên gelê Kurd û Rêber Apo ye. Van gavên ku îro tê avêtin jî, ji bo ku şer raweste, hem jî ji bo aramiya tê xwestin ku li Tirkiyê, Kurdistan û derdorê Kurdistanê çê bibe, ev gav di vê çarçoveyê de ne.

Niha em dibînin qeyranên ku li Rojhilata Navîn çê dibin ku li her derê pevçûn, kuştin ji Xezayê bigre, Lîbya, Luban, Yemen, Îran û her der di nava vê tevilheviyê de ye. Ji bo vê yekê yê ku aştî û aramiyê dixwaz in, em gelê Kurd in. Em dixwazin bê ku em bibin bandorê van pevçûnên ku niha li derdoran ji bo berjewendiyên xwe bi hev ketine, pirsgirêkê gelê Kurd ên dîrokî bê çareserkirin, ji ber ku neyên çareserkirin her ku biçe bêtir zirarê bighîne, hem bighîne gelê Kurd û hem jî wê bighîne derdorê, ji ber wê gavên hatine avêtin jî yek ji van gavan e.

Weke win zanin jî di salê 1993’an de agirbest çê bû, lê dewletê hin leşkerê xwe kuştin, kuştina wan jî xistin destê tevgerê de û kirin behanek, da ku careke din şer dest pê bike, pê re şerekî mezin dan destpêkirin, ev hemû be-



hane bûn ku gerîlayên azadiyê çiyayên Kurdistanê êriş dikin, da ku ew êrişên xwe li ser gerîla rewa bike. Dewletê di salê 2007, 2008 û 2015’an de jî ev rêbaz dida meşandin. Gelek caran dewletê ev yek li hemberî agirbestê pêk aniyê. Ji bo vê yekê ev gavên ku hatine avêtin, pêvajoya ku Rêber Apo daye destpêkirin, ji aliyê Tevgera Azadiyê ve şerê çekdarî hate rawestandin, li ser wê bingehê jî gavên dîrokî yê çek îmhaikirinê û vekişandina jî sînorê Bakurê Kurdistanê hatin avêtin, da ku hincet di destê dewletê de nemîne û şer bidawî bibe.


Niha gavên tê xwestin ku werin avêtin, pêwîst e ji aliyê dewleta Tirk ve be. Banga Rêber Apo û gavên dîrokî yên ku Tevgera Azadiyê avêtine tekez dike ku gelê Kurd, Tevgera Azadiyê û Rêber Apo aştî û aramiyê dixwazin û yê ku her tim şer dixwaze dewlete. Ev gavên ku hatine avêtin hiştiye ku dewlet di asta navneteweyî de lewaz û asteng bibe ê ku piştgirî jî jêre dikirin NATo ye, ev hemû jî gelê Kurd qebûl nakin. Niha pêvajoyeke têkoşîneke siyasî ye ku ji her kesî re hatiye isbatkirin gelê Kurd gelekî aştîxwaze û dixwaze pirsgirêka wê were çareserkirin, aliyê ku naxwaze ev yek pêk bê jî dewleta Tirk e.

**Rexmî hemû nêzîkatiyên nebes ên ji bo pêvajoyê ji aliyê dewleta Tirk û Komisyona ku hatiye avakirin, lê Tevgera Azadiyê hin gavên dîrokî avêtine, ji bo wê çi pêwîst dike ji bo serxistina vê pêvajoyê?**

Tişta niha ji her demê bêtir tê xwestin ku dewleta Tirk gavên bi pratîk bavêje, rê li pêşiya kesên ku ji malên xwe derketine veke û nebe asteng. Gelek qonax hene ku divê dewleta Tirk li ser raweste, gava yekem jî binpêkirinên qanûnî ne. Ji ber ku di bin navê binpêkirinê qanûnî de bi hezaran kes ên ku bi zimanê Kurdî axivîne, gotina PKK’ê anîne ziman û hwd… dewletê kir hincet ku van kesan heya roja îro di zindanan de bihêlin. Ji ber vê yekê pêwîst e di destpêkê de binpêkirinên qanûnî werin sererastkirin û ev kes werin berdan. Ev yek jî, ji berlemanê Tirkiyê û Komisyon ku hatiye avakirin tê xwestin. Lê mixabin heya roja îro tişteke nehatiye xuyakirin û zelalkirin ji vê komisyonê. Ema em bi hêvîne ku di rojên pêş de dewlet jî gavan biavêje. Herwiha ya girîng ku pêwîst e bawerî were çandin di vî warî de, bi taybet li cem Kurd baweriyê bide avakirin. Her nîqaşek di aliyê siyasî de tê kirin, dewleta Tirk şertan dike ku dibêje divê Kurd vê gavê bavêje, ez ê jî vê bavêjim, lê tevî gelê Kurd gelek gav avêtin, hîna jî gotinên dewleta Tirk di tewriyê de ne. Di sala 2009’an de dîsa gerîla ji bo aştiyê vekirişandin pêk anî. Lê dewletê êriş nedan rawestandin, îsal jî eyîn tê jiyankirin. Di 26’ê Cotmehê de Tevgera Azadiyê bi daxuyaniyeke ferîm ragihand ku ew jî sînorê Bakur vedikişin, da ku aştî pêk bê. Li gorî van gavên dîrokî ku têne avêtin jî, dewleta Tirk her di êrişên xwe de bi israre. Bêguman Tevgerê Azadiyê û gelê Kurd ji bo van êriş û kiriyaran, amadekariyên xwe baş girtine. Mirovek eger rastî pêvajoya aştiyê bixwaze, wê şerê çekdarî û nifertê ji holê rake û pêwîst e dewlet vê fêm bike. Ev ji her alî jî tê xwestin ku fêm bikin. Lewma divê di rêya nîqaşên siyasî de, fêmkirin were çêkirin û ev dem dema pêkanîna aştî û civaka demokratîk e. Em jî bihêvîne ku dewleta Tirk, Tevgera Azadiyê dîsa mecbûr neke ku careke vegerin sînor.

**Di daxuyaniya Tevgera Azadiyê ya vekişandina ji sînorê Bakurê Kurdistanê de ev bang hatibû kirin; banga me di serî de ji bo jin û ciwanan ji bo hemû gelê me ye, pêvajo ne ew pêvajoya ku ji hinekan hin tiştan hêvî bikin, lê pêvajoya ku bi têkoşîna rêxistinkirî, avakirin, qezenckirina jiyana azad û demorkratîk e, win vê bangê çawa dinirxînin?**

Tevgera Azdiyê û tevahî gelê Kurd istratîjîyeke xwe ya xurt çêbûye ku gihaştiye astekê xwe nas bike, dijminê xwe nas bikin û çawa nêzî wan bibe. Ji ber vê yekê li gorî vê pêvajoyê xebatên siyasî bêtir encamê digire. Dibe ku dema ev gavên vekişandinê hat kirin, di nava gel de rêfilêkis derket, lê ev hemû ji berjewendiyên gel e, hem jî ev yek li cîhanê tevahî deng veda. Heta ew dostên dewleta Tirk ê ku nikarîbûn tiştekî bêjin, niha ew jî ketine tevgerê û dixwazin dewleta Tirk gavên bi erênî bavêjin. Ev hemû nayê wê watiyê ku gelê Kurd li vir rawestiya, lê berovajî wê asta têkoşîna siyasî û hemû aliyan bilindtir bûye. Helbet heger tevgerek pêşengên wê jin û ciwan bin, wê teqez bikser bikevin, ji ber di nav evqas salan de berpirsyarî girtine ser milê xwe û xwe birêxistin kirine. Gelê Kurd li her derê tişta jê tê xwestin xwe birêxistin bikin, armanca mafê xwe nas bikin û asta têkoşînê li ser binghê diplomasî û siyasî xurt bikin. Ya herî girîng jî em xwe berpirsyarê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bibinîn û azadiya wî misoger bikin.



FENER



## Rewatî Bizaveke Demokratîk A Pêşerojê Tayîn Dike Ye

**Idrîs Henan**

Di dirêjahiya aloziya li herêmê û taybet li Sûriyê, hemû aliyên di têkoşîna rêkberiya ber bi desteserkirina desthilatdariya li Sûriyê ve, bi dehan sûcên şer pêk anîn û bendewariya gelan a bicihanîna edalet, wekhevî û demokrasiyê îzole kirin.

Girûpên çekdar ên cuda cuda û taybet ên ku vîna xwe radestî istixbarata Tirk û odeyên wê yên şerê taybet kiribûn, di oxira berjewendiyên dagirkeriyê de li gelek deran şer kirin û li Sûriyê weke kurtêlxwar êrişî vîna gelan a hebûna azad kirin. Li ser bingeha vê hişmendiya paramîlîter a ku aloziya Sûriyê bi xwe afirandiye, her komeke leşkerî, di nav de DAIŞ, HTŞ û hemû çeteyên girêdayî Tirko, li cihê ku xesib kirine, xanedaniyên destpot ên dermirovî ava kirin.

Tevliheviyek wisa aloz bi xwe re projeya çareseriyê jî tevlihev kiriye û her dosyaya ji bo çareseriyê were pêşkêşkirin, xistiye pozisyona şik û gumanê. Lew re jî, civaka navneteweyî di navbera berjewendiya global a hegemoniyê û daxwazên gelan ên jiyana azad de maye û li hemberî aloziya li Sûriyê bê helwest bûye. Nekariya bi rola belansê rabe û ne jî kariye konsepteke zelal ya çareseriyê pêşkêş bike. Vê yekê bi xwe re alozî derbasî qonaxeke kûrtir kir ku asta kirîmînal a pêvajoya aloziyê bilindtir kir. Sîstem û otorîteyên xwecihî yên teng li ser cografyayên cihêreng ên Sûriyeyê - Bakur û Rojhilatî Sûriyê jê derxîne - nikarin sentezekî çareseriya demokratîk ava bikin. Berovajî wê yekê, destpotiya amator ku bi metodên klasîk ên desthilatdariya ceribandî, bi rêbaza xweşibandina rejîma Baas û elimandinên wê, ji nû ve xwe dîzayîn kirin û her tişt li dora xwe zivirandin. Ev jî bû sersebebê ku dizî, talanî, teslîmgirtin û vîn radestkirin zêde bibe û veguherin pêlîstokên di destê neyar û dagirkeran de. Pêzanîna han, bi ketina rejîma Esad re, ji bo desthilata HTŞ bû elimandin, teqlîd û kevneşopiyek desteserkirina qesrên Şamê ku ji bilî xizmetkirina ecîndeyên derve ti xizmetek din a ji dil nakin! Ji ber vê jî ti rewatiyeke siyasî û exlaqî nagira ser xwe ku hewl dide li zeviyên Baasê tovên xwe biçine û demokrasiyê biçîne!!

Êdî mirov nikare li Sûriyê qala vîna neteweyî û serweriyê bike. Çendîn HTŞ rêbazên faşîzane yên komkujî û qirkirinê pêk bîne jî, nikare wê dûrî mentelîteya rêbir û hişmendiya çetetiyê bike. Li ser mîrata Baas û bi maska “dewleta yekbûyî” êdî berê xwe daye têgihaştina hêz û şîdetê ku temsîla vîna gelan û hevpeymana civakî nake. Li şûna ku veguhere sîstemeke siyasî karibe nûnertiya beşek civaka Sûriyê bike, bûye toreyek berjewendiyên dijber ku li gorî hinek lihevkirinên ewlekarî û aborî li ser bingeha gendelî û şeran xwe dide domandin.

Tişta ku birîna li Sûriyê kûrtir dike ew e; ev tore li şûna ku sûdê ji ezmûna demokratîk a li Bakur û Rojhilatî Sûriyê, herêmên Rêveberiya Xweser pratîze bûye, werbigire, berê xwe daye eniyên şer û provakasyonan û bijardeya demokratîkbûna Sûriyê red dike. Diyar e ezmûn û aqûbeta Baas`ê jê re nebûye ders û pîvan ku Sûriyê nikare bi yekdestariyeke navendî ya hişk were birêvebirin. Ta ku pêşeroja welat bikeve bin gerantiyê, hewceya lezgîn bi şêweyekî birêvebirina demokratîk ku hemû çand, etnîk û baweriyan dihewîne nava xwe. Divê êdî dest ji derew û nepixandinên Medya Dîjîtal berdin ku bi wereq û kertonan nabin leheng. Rewatî li paş peredeyan, di odeyên reş ên istixbarata Tirkiyê de nayê destgirtin. Rewatî bizaveke demokratîk a gelan e ku şikil û şêwazê birêveberiya exlaq polîtîk a pêşeroja welat diyar dike ye.